

XANÎNASÎ

Edîtorler

Doç. Dr. Abdulhadi TİMURTAŞ

Doç. Dr. M. Zahir ERTEKİN

Doç. Dr. Ayhan TEK

 PEYWEND

PEYWEND Peywend Akademî

Gerîndeyê Giştî

M. Xalid SADÎNÎ

Navê Pirtûkê

Xanînasî

Edîtor

Abdulhadi TÎMURTAŞ

M. Zahir ERTEKÎN

Ayhan TEK

Cure

Peywend Akademî - 6

Isbn

978-625-7568-26-5

Nimroya Weşanê

136/4

Berg û Mîzanpaj

Dr. Îbrahîm Mîrza

Çap

Wan, 2021 - Çapa 1.

Çapxane

Bizim Büro Basım Evi Yayın ve Dağıtım
Hizmetleri Sanayi ve Tic.Ltd.Şti.

Sertifika

42488

Weşanxane

Peywend

Nedim Odabaşı İş Merkezi

Kat: 1 No: 33 İpekyolu VAN

GSM: 0532 354 44 65

   @peywendkitab

 www.peywend.com

 www.kitabakurdi.com

Ji bilî jêgirtinên kurt ên ji bo danasînê, bêyî destûra nivîskî ya
Weşanên Peywendê bi tu awayî nikare bê zêdekirin û kopîkirin.

© Weşanên Peywend, 2021

Takdim

Malum olduđu üzere, bir şeyin kıymeti nedretindedir, yani bir şey ne kadar az bulunursa o kadar değer kazanır. Bu durum insanlar için de geçerlidir elbette. Halkların ve toplumların tarihlerinde eserleri, görüşleri ve idealleriyle ölümsüz bir nam ve kalıcı bir konum elde etmiş çok az şahsiyet vardır.

Elinizdeki çalışmanın şahsiyeti de o nadir ölümsüz insanlardan biridir. İlim, irfan, edebiyat ve sanat mahfillerinde Ehmedê Xanî'yi tanımayan bilmeyen çok az insan vardır sanırım.

330 yıl gibi uzun bir zamanın ardından, eğer ki detaylı ve bilimsel çalışmalarla ondan söz ediyor ve tartışıyorsak, onun bize bıraktığı düşünsel ve edebî bir miras-tan bahsediyorsak, şüphesiz bunun haklı sebepleri vardır.

Çalışmadaki makalelerden de anlaşılacaktır ki Xanî bir ilim, irfan ve edebiyat insanı, farklı fikirleri ve idealleri olan bir aydın ve müstesna bir şairdir. Çevresinden haberdar olan, toplumuna karşı bir aydın duyarlılığı ve sorumluluğu taşıyan, fikirleriyle aydınlık veren pencereler açan bir şahsiyet olarak, kendi dönemini ve coğrafyasını iyi okuyup tahlil edebilen bir kişilik olarak düşünce ve edebiyat tarihinde yerini almıştır. Xanî bilgeliğinin servet ve hasılatını kendisiyle beraber kabre götürmemiş, bilakis kendisinden sonraki nesillere zengin bir miras olarak eserlerini, fikirlerini, ideallerini, önerilerini ve yol göstericiliğini bırakmıştır.

Özellikle edebiyat bağlamında, İngilizler için Shakespeare ne ifade ediyorsa, İtalyanlar için Dante, Farslar için Firdewsi, Yunanlar için İlyada ve Odysie ne anlama geliyorsa, bizim için de Ehmedê Xanî o anlama geliyor şüphesiz. Bir tek Mem û Zîn gibi bir şaheserle de kalırsa, Xanî yine da edebiyat tarihimizin ender şahsiyetlerinden biri olacaktır. Kaldı ki Mem û Zîn'in dışında başka eserlerle bize zengin bir miras bırakmıştır

Üniversite olarak, bilim, sanat, kültür ve edebiyat noktasında böyle bilimsel ve kolektif çalışmaların gerçekleştirilmesinden onur ve sevinç duyuyoruz. Bu tür çalışma ve aktivitelerin hayırlara ve bilincin çoğalmasına vesile olmasını yürekten diliyorum.

Emek verip böyle bir çalışmanın gerçekleştirilmesinde zahmet çeken editörlere ve makale yazarlarına teşekkür ederim.

Prof. Dr. Hamdullah ŞEVLİ

Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Rektörü

Katkıda Bulunanlar

Hasan ÇİFTÇİ
M. Nesim DORU
Mehmet Halil ÇİÇEK
Osman ASLANOĞLU
Hayreddin KIZIL
Zafer AÇAR
Prewîz CÎHANÎ
Abdurrahman Adak
Ahmet KIRKAN
Ümit IŞIK
تهحسين نئيراهيم دۆسكى
Mehmet Salih GECİT
Üyesi Ruhullah ÖZ
Abdulcebbar KAVAK
Abdulahdi TİMURTAŞ
İsmail Aydoğdu
Zülküf ERGÜN
Şerif GÜZEL
بوار نوورمهدين
Hayrullah Acar
M. Zahir ERTEKİN
Bedrettin BASUĞUY
Sami ÇELİKTAŞ
Yaşar Kaplan
Shahab Vali

Not: Bu kitapta yer alan bilgi ve düşünceler yazarını bağlar. Bu kitaptaki makalelerin bir kısmı Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü tarafından 22-23 Haziran 2021 tarihlerinde düzenlenen Ehmedê Xanî ve Mîrası temalı II. Kürdiyât Sempozyumunda sunulan Sözlü bildirilerin gözden geçirilmiş ve kitap bölümüne dönüştürülmüş halidir.

NAVEROK

Ji Edîtoran.....	9
Ana Hatlarıyla Ahmed-i Hânî ve Sanatı	13
	Hasan ÇİFTÇİ
Xanî: Seyda û Koçer	41
	Prof. Dr. M. Nesim DORU
Bir Islahatçı Olarak Ahmed-i Hani	53
	Prof. Dr. Mehmet Halil ÇİÇEK
Mîrasa Ehmedê Xanî	71
	Doç. Dr. Osman ASLANOĞLU
Bikaranîna “Jı Bo.....Ra’yê di Mem û Zîna Ehmedê Xanî de	83
	Hayreddin KIZIL
Şêwaza Zimanî di Mem û Zînê de.....	95
	Zafer AÇAR
Cuwankariyên Toreyî di Mem û Zîna Ehmedê Xanî Da: Teşbîh û Isti’are Wek Numû- ne	111
	Dr. Prewîz CÎHANÎ
Gelo Mem û Zîn Dikare Bibe Klasîkeke Cîhanê?	127
	Abdurrahman Adak
Berhemên Ehmedê Xanî; Şerh, Tercume û Nezîreyê Ke Berhemanê Ey Ser O Nusî- yayê	147
	Ahmet KIRKAN

Nûbihara Biçûkan (Ehmedê Xanî)165

Ümit IŞIK

بزاڤين كۆمكرن و شرۆڤهكرنا ديوانى خانى ژ لايى فهكولمزين كورد فه 77

تههسين ئيبراهيم دۆسكى

Şeyh Ahmed-i Xanî'nin İtikadî ve Kelâmî Görüşleri187

Doç. Dr. Mehmet Salih GECİT

Nirxandina Eqîda Xanî Ji Hêla Kelamî ve 203

Dr. Öğr. Üyesi Ruhullah ÖZ

Tesewuf di Berhemên Ehmedê Xanî de (Ahmed-î Hânî'nin Eserlerinde Tasavvuf) . 213

Doç. Dr. Abdulcebbar KAVAK

Di Berhemên Ehmedê Xanî da Işqa Îlahî..... 229

Doç. Dr. Abdulhadi TİMURTAŞ

Kürt Milliyetçiliğinin Oluşum Sürecinde Ehmedê Xanî ve Mem û Zîn'in Rolü ... 239

İsmail Aydoğdu

Ehmedê Xanî Wek Hêmaneke Nasnameya Kurdî ya Modern.....257

Zülküf ERGÜN

Bîbliyografyaya Ehmedê Xanî267

Şerif GÜZEL

بئههمدى خانى بيبليوگرافيا و پيرستى له پرۆژهى (كورد و كوردستان- بيبليوگرافيا و پيرستيان له كتيبي
2010 1903- (2010 1920- كورديدا 283

بوار نوورهدين

Nusxeyên Destxet yên Mem û Zînê..... 307

Hayrullah Acar

Şerhek li Dor Helbesta “**Zahîdê Xelwetnîşîn**” a Ehmedê Xanî 339

M. Zahir ERTEKİN & Bedrettin BASUĞUY

Mûsîqa di Mem û Zîna Ehmedê Xanî de.....	355
	Sami ÇELİKTAŞ
Folklor di Mem û Zîna Ehmedê Xanî da	367
	Yaşar Kaplan
Ji Mîtolojîyê ber bi Destanê Kesayeta Şehîd: di Mînaka Mem û Zîna Hewramî De Xwîna Siyawêş- Xwîna Mem.....	383
	Shahab Vali

Folklor di Mem û Zîna Ehmedê Xanî da

Yaşar Kaplan^{1*}

Destpêk

Folklor, zanistek e ku çanda maddî û me'newî ya gelekî li dû rêbazên xwe yê ten taybet berhev dike, vedikole, analîz dike û dinirxîne. Zanista folklorê di sedsala XIXan da ji Ewropayê derkeftîye û ji du peyvên Îngilîzî pêk tê: folk (gel) û lore (zanist). Ev peyv cara ewilî di 22 Tebaxa 1846an da ji aliyê Willîam John Thomsî ve li kovara Athenaeum hatîye bikarînan (Oy, 1997, s. 367). Di kurmancî da şûna folklorê peyvên wekî zargotin, gelnasî û keleşor tê gotin. Zanista folklorê piştî avabûna netew-dewletan werareke baş wergirtîye û pêşkeftîye. Ev zanist taybetî ji bo dîyarkirina rehûrîşal û sînoren milletekî û herwesa derêxistina nasnameya maddî û me'newî ya milletekî roleke gelek mezin gêraye. Ji ber vê çendê her milletekî bi saya hêza sîyasî ya dewleta xwe xebatên folklorê pêş da birine. Her çend kurd wekî milletekî bê dewlet ji vê çendê bêpar mabin jî dîsa em dikarin bibêjin bi xêra hinek vekolerên bîyanî û xuyanî gelek xebatên berkeftî li ser folklorê kurdî hatine kirin.

Folklorê peywendîyeke xurt digel cûreyên edebîyatê yê din heye. Folklorê kurdî taybetî ji bo xudankirina ziman, edebîyata klasîk, edebîyata nûjen, sînema, medya û gelek biwarên bi zimanî ve girêdayî roleke berçav heye. Yek biwara girîng ya folklorê jê ra bûye çavkanî edebîyata klasîk ya kurdî ye. Gelek nivîskar û helbestvanên edebîyata kurdî ya klasîk mijara berhema xwe ji folklorê kurdî wergirtine û li dû têgehiştin, şîrove û xeyala xwe ew mijar bi awayekî cuda vegotine. Dema behsa vê çendê bête kirin yekser Mem û Zîna Ehmedê Xanî têtê bîra mirovan.

Ehmedê Xanî di sala 1651ê ji malbat û 'eşîretek binyad Hekarî li Bazîdê hatîye dinê û di sala 1707ê li heman derê çûye ber dilovanîya Xwedê. Berhemên Xanî yê bi navê Nûbihara Biçûkan (1683), Eqîdeya Îmanê (1687), Dîwan (hinek helbestên

1 * Dr. Yaşar Kaplan, Zanîngeha Hakkari, Fakulteya Ilahiyatê.

wî) û Mem û Zîn (1694) gehiştine roja me ya îro. Berhema wî ya herî bi navûdeng Memû Zîn e û ev berhema wekî mesnewîyê hatîye nivîsîn. Ev berhema ji 2656 beytan pêk tê (Ji bo derbarê Xanî û berhemen wî da pitir agahîyan bnr: Cîhanî, 2013; Ciwan, 1997; Tek, 2015; Yıldırım, 2010). Mesnewî peyvek e ‘erebî ye û me’na wê “du duwe” ye. Ev cûrê edebî cara ‘ewilî di edebîyata farisî da hatîye bikarînan. Her malikeke mesnewîyê ji du ristên hemqafîye pêk tê û mirov dikare naveroka wê bişîbîne roman û çîrokên îroyîn (Çiçekler, 2004, s. 320). Mesnewî ji bo vegotina beyt, dastan û çîrokên folklorîk destxweştirîn cûreyê edebî ye. Ji ber vê çendê Leyl û Mecnûn, Yûsûf û Zuleyxa, Şehname, Îskendername û gelek serhatiyên din bi terzê mesnewîyê hatine nivîsîn.

Memê Alan û Mem û Zîn

Mem û Zîna Ehmedê Xanî peywendîyek xurt digel folklorê kurdî heye. Ev peywendî bi du awayan derdikeve meydanê. Ya yekê jêdera mijara berhema Xanî ji destaneke folklorîk hatîye wergirtin. Heke bi awayekî dî bête gotin Xanî, berhema xwe li ser binyadê destaneke gelêrî ava kirîye. Ya duyê Xanî di berhema xwe da derbarê folklor, jîyan û bîr û baweriyên wê serdemî agahiyên giranbiha dide. Ji ber vê çendê em dikarin bibêjin Mem û Zîna Ehmedê Xanî hem jêdera xwe ji folklorê kurdî wergirtîye hem jî ew bi xwe bûye jêderê ji bo danasîna folklorê serdema xwe. Destana Memê Alan ya Ehmedê Xanî ji bo berhema xwe Mem û Zînê wekî jêderê karînayî, bi diristî nahêt zanîn kanê kengî derkeftîye meydanê. Lê belê ji varyantên wê yên hatîne tomakirin em têdigehin ku şopên Îslamî tê da serdest in. Heke ev destane hêj berî Îslamê derkeftibe jî piştî muslimanbûna kurdan, Îslamê rengê xwe daye vê destanê (Korkmaz, 2019, ss. 47-48).

Ehmedê Xanî di beşa 7an da ji bo vebûna çavê dilê wî û derbirîna hizir û bîrên îfadekirina wan gelek zehmet, gazî saqî dike û ji wî dixwaze şerabê berde di qe-dehê. Di vê beşê da bi awayekî vekirî dibêje ez dixwazim şerha xema dil bikim efsane û ji bo vê çendê jî ez dê Mem û Zînê bikim behane. Ew dixwaze Zîn û Memê ji nû vejîne û bi terzê û uslûba xwe ve wan meşhûr bike (Xanî, 2010, ss. 50-51). Xanî bi eşkerayî îşaretê dide hindê ku dê berhema xwe li ser serhatîya Mem û Zîna li nav gel da belav ava bike. Lê belê digel vê çendê ew di berdewamîyê da dîyar dike ku berhema wî ji aliyê naverok, teşe, uslûb û peyvan ve ji kesê nehatîye deynkirin û wî, berhema xwe li dû hizir û bîr û xeyalên xwe serejinû nivîsîye (Xanî, 2010, s. 53). Ehmedê Xanî di Mem û Zînê da bi gelek helkeftan behsê wan kesan dikê yên serhatîya Mem û Zînê jê bihîstî û ji wan ev hîkayete neqil kirî. Di beşa 8an da dema dest bi hîkayê dike îşaretê dide vê çendê û wiha dibêje:

*“Neqqaşê sehîfeyê hikayet
Neqqadê sebîkeyê rîwayet*

*Kêşa bî vê terhê resm û ayîn
Lê da bî vê terzê derb û tezyîn*

*Go: Padîşahek zemanê sabîq
Rabû dî hukumeta xwe faîq” (Xanî, 2010, s. 55)*

Xanî bi van îfadeyan ve dîyar dike ku wî ev hîkaye ji hinek kesan bihîstîye û ew wîha rîwayet dikan. Ji bo kesên vê hîkayetê rîwayet dikan an jî vedibêjin pîranî navê “rawî” bi kar tîne (Xanî, 2010, s. 58). Di edebîyata kurdî ya devkî da ji bo kesên destan, çîrok an jî beytan vedibêjin navê wekî dengbêj, beytbêj, çîrokbêj, qewlbêj tête bikaranîn. Lê belê Xanî li dû istilaha xwe navê rawî lê tîne ku ev peyv ji ‘ilmê hedîsê wergirtîye. Her çend Ehmedê Xanî palpiştîyê bi vegotinên rawî bike jî vegotinên hemî caran digel varyantên devkî nagunce. Bo nimûne dema piştî mirina Mem û Zîn û Beko derbarê rewşa wan ya biheştê da ji Şêxekî hinek tiştan rîwayet dike (Xanî, 2010, ss. 277-282), em vê vegotinê di varyantên devkî da nabînin.

Newroz û Sersal

Cejna Newrozê di Mem û Zîna Ehmedê Xanî da cihêkî girîng digire. Lê belê beramberî vê çendê di varyantên Memê Alan an jî Mem û Zînên devkî da behsê Newrozê nahê kirin. Xanî bi danasîna cejna Newrozê dest bi hîkayeya mesnewîya xwe dike û herwesa lehengên berhema xwe Mem û Zînê di pîrozbahîyeke cejna Newrozê da bi hevdû dide nasîn. Di sê beşan da (11, 12, 13) Newrozê dide nasîn û behsa çawanîya pîrozkirina wê cejnê dike. Di sernavê beşa 11an da wiha dibêje: “Dastana beyana Newroza Sultanî, Tesmîyeê mewsimê surûr û şadîmanî, Bî mersûmê qedîmê Kurdîstanî, Ku wan dîgotê sersal, ‘Ed dîkîrîn bî ‘îdê wîsal.” (Xanî, 2010, s. 67) Li dû vegotina Xanî, Xudê te’ala gerdûn û feza bi awayekî gelek bi rêkûpêk afirandîye û her cismekî esmanî wezîfeyekê pêk tîne ku yek ji van wezîfan nûkirina salê ye. Xanî, paşî ji rawîyê xwe yê kuhensal rîwayet dike û dibêje, li dû ‘adetê pêşîyê zamanan dema rojê di meha adarê da sala xwe diqedand, xwe nû dikir û dihate di burca sersalê da, ji şîrî heta pîrî herkes ji mala xwe derdikevt. Ev roj wekî Newroz dihate binavkirin û ji bo rêz û hûrmet girtina bo wê rojê xelkî qesta mêrg û çîmenan dikir. Taybetî keç û kuran wê rojê xemla xwe dikirin. Lê belê ew ji çarçova şerî’et û sunnetê dervedikevtin û wan çî nîyetên xirab an jî hesteke minetê li nik nebû. Meqseda keç û xortan ji derkeftina seyran û geştê, peydakirina babet û henkûfên xwe bû (Xanî, 2010, ss. 67-69).

Ehmedê Xanî piştî bi awayekî giştî Newroz û sersal daye nasîn êdî taybetî behsa Newroza Bohtan dike. Li dû vegotina wî, ji ber kevneşopîya qedîmî dema roja Newrozê hatî xelkê Bohtan bi carekê ji bajêrî, kelatê û ji malan derkevtin û xuşîyane seyran û geştê. Ji bo pîrozkirina Newroz û sersalê jin û mêran, pîr û kalan, mezin û biçûkan û keç û xortan hemîyan pêkve qesta geşt û seyranan dikirin.

Hem xatûnên sere û hem jî keçên bakîre di vê mîhrîcanê da bê perde û çarî bûn. Taybetî keç û xort her wekî dawet û dîlanekê xemla xwe girêdidin û xwe nîşanî hevdû didin. Meqseda wan jî vê çendê dîyarbûn û hevdûhesîna evîndaran e. Keçan ciwanîyên xwe ‘erz dikirin û bi vî rengî dibûne firoşte û herwesa xort jî dibûne bikirê evînê. Bi vî awayî Newroz û sersal dihate pîrozkirin (Xanî, 2010, ss. 70-71). Ji danasîna Newrozê ya Xanî em têdigeihin ku Newroz û sersal wekî cejneke biharê dihate pîrozkirin û çî naveroka wê ya netewî dîyar nake. Dema em bala xwe didin Newroz û sersal pîrozkirina Mem, Tacdîn, Sitî û Zînê rastî hinek dîyardeyên cûda yên bi folklorê ve girêdayî tèn.

Lîbasguhorîn an jî Tebdîlî Qîyafet

Di Mem û Zîna Xanî da dema Mem û Tacdîn û herwesa Sitî û Zîn ji bo çûna Newrozê destûrê ji mîrî werdigirin, herdû cwîn (birr) kincên xwe diguhorin û kur wekî keçan û keç jî wekî kuran xwe dixemilînin. Meqseda Mem û Tacdîn ew e ku kes çî tekîfan li wan neke (Xanî, 2010, s. 72-73). Mesela lîbasguhorînê di varyantên Memê Alan yên devkî da nîne. Lê belê di gelek serhatî û hîkayetên folklorîk da nimûneyên lîbasguhorînê hene. Gelek caran mîr an hakimê deverekê ji bo teftêşkirina rewşa milletê xwe kincên xwe yên mîratîyê derdixin û hinek kincên dî yên feqîran li xwe dikin. Herwesa hinek lehengên çîrok û serhatîyan ji bo bi nêzîk ve nasîna kesekî/a navubangê wê bihîstî an jî ji bo ceribandina kesekî/ê kincên xwe diguhorin û rengêkî nenas didene xwe. Bo nimûne Cembelîyê kurê Mîrê Hekarîyan kincên mîratîyê derdixe û kincên şivanan li xwe dike.

Nîşanguhorîn

Di çîrok û serhatîyên folklorîk da gelek nimûneyên nîşanguhorîna evîndaran hene. Hem di Mem û Zîna Ehmedê Xanî da hem jî di Memê Alan da gustîrguhorîna evîndaran heye. Di Mem û Zînê da dema lehengên mesnewîyê lîbasên xwe guhorî û çûne pîrozkirina newroz û sersalê herdû alî hevdû dibînin û Mem û Tacdîn li ser hişê xwe diçin û dikevin erdî. Dema Zîn û Sitî tèn hindav serê wan bêyî ku tişteki bibêjine hevdû gustîrên wan ji tilîyên wan derdixin û herwesa gustîrên xwe yên mohra wan li ser didanin şûna wan. Piştî Mem û Tacdîn hişyar dibin bi gustîrên tilîyên xwe dihesin û navê Sitî û Zînê dizanin. Hingê têdigeihin ku ew ên di roja Newrozê da dîtî du keç in bi navê Sitî û Zîn (Xanî, 2010, ss. 79-84). Gustîrguhorîn tête me’na soz û qewl û qerarê. Heke yekî/ê gustîra xwe da yekî/ê ev e hindê radigehîne ku êdî herdû alîyan hezkirina xwe beramberî hev derbirîne û soz dane êkûdu. Lewra evîndarîya bê dîyarî û nîşan wekî hezkirineke bê bîngêh tête dîtî. Ji ber vê çendê evîndarên rasteqîn tiştên ber dilê wan ji hemî tiştî şîrîntir wekî dîyarî didin hezkirîyê/a xwe û sebr û sukûna xwe pê tînin. Di stiraneke kurdî da wiha tête gotin:

*“Ez çûme ber bêlayê, çî bêlayek serşor e
Rîşyêd qerepoşiyê, enya zer guregure
Eger dê bî yarka mîn, nîşanekê b’guhore”* (Kaplan, 2015, s. 121)

Dawet

Di Mem û Zîna Xanî da mijara folklorê ya ji hemîyan zêdetir behsê wê tete kirin dawet û rêûresmên girêdayî wê ne. Di vê babetê da behsê kefaet, teklîfa zewacê, jin xwastinê, veguhestina bûkê, dawet û dîlanê, şeva gerdekê û xwarin û vexwarinên di van helkeftan da tene danê bi berfirehî tete kirin.

Kefaet û Teklîfa Zewacê

Kefaet peyvek e ‘erebî ye û me’na manendî, henkufî û wekhevîyê dide. Di lîteratura Îslamî da ji bo parastina hemahengî û berdehamîya zewacê hişyarî li kefaet û henkûfîya di navbera herdû alîyên zewacê tete kirin (Aktan, 2002, s. 166). Li dû vegotina Xanî dema Heyzebûn dixwaze evîndarên Sitî û Zînê peyda bike, diçe nik remmalî da nav û nîşanên Tacdîn û Memê bizane. Dema remmal ji remla xwe derdixe ku ew du kur in, Heyzeran dixwaze bizane kanê ev herdû kes henkûfên Sitî û Zînê ne an na:

*“Lakîn tu bibêje ew çî nesl in
Qenc keşfê bike ku ew çî nesl in*

*Begzade ne ew, ‘alîmeqam in
Cundîneseb in we ya ‘ewam in”* (Xanî, 2010, s. 98)

Di vê pirsê da dîyar dibe ku meqseda Heyzebûnê tenê zanîna navên evîndaran nîne. Ew dixwaze statûya wan ya çînî bizane. Remmal di bersiva xwe da dîyar dike ku di dîne eşqê da danûstandinek heye dibêjin terazî yanî henkûfî. Lê belê heke şertê henkûfîyê bi cih nehêt jî dirist e. Çunkî şertê peymanê jihevrazîbûn e. Remmal di berdehamîya axaftina xwe da pesend dike ku yek ji wan herdû kuran begzade ye û yê din jî ji nesebê debîran e (Xanî, 2010, s. 99). Dema Heyzebûn Tacdîn û Memî peyda dike hingê jî ji wan dixwaze ku nav û neseba xwe dîyar bikin (Xanî, 2010, s. 104). Dema nav û nesebê wan dizane vedigere cem Sitî û Zînê û ji bo wan dîyar dike ku hem ji alîyê ciwanîyê ve hem jî ji alîyê statûya çînî ve ew herdû kesên wan hîlbijartî henkûfên wan in. Heyzebûn di vê noqteyê da dibêje heke ew ji alîyê statûya çînî ve çî begzade an jî geda bana û henkufên we nebana jî di ciwanî û evînê da henkûfê we ne û ev çende bes (Xanî, 2010, s. 107). Herwesa di dema xwestina Sitîyê ji bo Tacdînî da jî em rastî behsê kefatê tene û xwezgînî behsê mîrzabûna (begzadebûna) Tacdînî dikin (Xanî, 2010, s. 112). Em ji vê çendê têdigehekin ku di wî serdemî da kefaet û henkûfîya çînî şertekî muhim ê zewacê bû. Dema em bi çavekî giştî li serhatîyên evînî yên folklorê kurdî binêrin, em dê

bibînin piranîya evîndaran ji bilî henkûfîya ciwanî û evînî herwesa ji alîyê statûya çînî ve jî henkûfên hev in.

Piştî evîndar ji hevdû agahdar dibin û nasnama hevdû baş dizanin Heyzebûn dibe navbeynkarê herdû alîyan. Di kurdî da ji bo navbeynkar û peyangerînê evîndaran “navdesk” tête gotin. Êdî hemî peyama bi wasita navdeskî tên û diçin û evîndar rû bi rû hevdû nabînin. Çunkî Sîtî û Zîn heremserayê dijîn û hevdûdîtina wan ne mumkîn e. Sîtî û Zîn ji Heyzebûnê dixwazin ew biçin cem Tacdîn û Memê û ji wan ra bibêje em wan ji bo zewacê qebûl dikin û heke ew jî me qebûl bikin bila xwezgîniyên xwe bişînin (Xanî, 2010, ss. 109-110). Ji vê çendê diyar dibe yêna cara ewilî teklîfa zewacê kirî keç in. Her çend di ciwaka kurdî da wesa bête qebulkirin ku kur teklîfa zewacê bo keçan biben jî di gelek serhatîyên evînê da cara ewilî keç teklîfa zewacê dikin an jî ew berê evîna xwe bo kuran eşkera dikin.

Jinxwestin

Xanî di Mem û Zînê da bi helkefta daweta Tacdîn û Sîtîyê bi berfirehî behsê rêûresmê jinxwestina wî serdemî dike. Piştî Heyzebûnê Tacdîn û Mem ji teklîfa zewacê ya Sîtî û Zînê agehdar kirî, ew radibin mal û ûcaxa xwe ji vê çendê xeberdar dikin. Mirovên wan ji vê çendê gelek keyfxweş dibin û bi te'essûba eqrebatîyê bi destekî sivik heyhetek ji ‘ûlema, ‘adil, ‘ûmera û kesên ji rêzê ji bo xwezgîniya Sîtîyê amade dikin (Xanî, 2010, s. 112). Em ji vê çendê têdîgehîna ku di dema xêr û şeran da malbat, ûcax, qebîle an jî ‘eşîret bi hevra bizavê dikin û ji bo pêkînana her karekî li pêşîya wan hemî cûre mirov beşdarîyê dikin. Di serî da ji bo du’akirinê melayek, hinek mirovên camêr û pêbawer, mezinên babikên ûcax û qebîlê û herwesa ji bo pêkînana hinek xizmetên di jinxwestinê da têne kirin xort û gencên ji rêzê lazim in. Kurd vê kevneşopîya xwe niha jî didomînin. Malbata Tacdîn tedarîka xwe dikin û diçine dîwana mîrî. Ser navê heyhetê wekîlek heye û ew wekîl lazim e mirovekî zana û xweşsohbet bît. Çunkî ew dê keçe ji babê wê bixwaze. Wekîlê heyheta Tacdîn bi axiftineke munasîb derê suhbetê vedike û Sîtîyê ji bo Tacdîn dixwaze. Mîr jî qedrê vê heyhetê digire û dibêje tiştê we munasîb dîtî min jî munasîb dît û bi vî terzî Sîtîyê dide Tacdînî. Piştî vê çendê dibêje wekîlê we kî ye bila bê xutbe û du’ayê bixwîne. Wekîl du’ayekê dike û paşî pêkve sûreya fatîhe dixwînin. Piştî fatîheyê birayê Tacdîn radibe û pê mîrî maç dike (Xanî, 2010, ss. 112-113). Ev rêûresme vê gavê jî li nav kurdan da li kar e. Piştî ku babê keçe keç da û mela fatîhe xwend, nêziktirîn eqrebayê zava radibe û destê wî kesê keç daye wan radimûse. Piştî mîrî Sîtî da Tacdînî û eqda herdûyan bestin, def û rebab têne qutan û xelk ji vê çendê têne agahdarkirin. Digel vê çendê şerbet li mêvanan tê belavkirin û bi vî şeklî şîrinahîya bûk û zavan tête xwarin. Mîr, xwarinineke şahane datîne li ber mêvanên xwe û vexwarinên tamxweş belav dike. Mîr bi xwe jî di vî karî da xizmetê dike. Herwesa stiranbêj li amûrên muzîkê dixin û stiran û awazên

xweş dixwînin. Paşê mîr Tacdîn û Mem dixwaze huzûra xwe û dîyarîyan dide wan û Memî dike birazavayê Tacdînî (Xanî, 2010, ss. 113-119).

Xemilandina Bûkê û Bukveguheztin

Xanî derbarê xemilandin û veguhestina bûkê da teswîreke baş ya wî zamanî dike. Li dû vegotina Xanî, meşşate (kuafêr), dayê û xizmetkaran xemla Sifîyê û Zîna berbûk çêkirine. Bi teswîrên zindî behsê ciwanî û xemla wan dike û em têdigihin ku xena bûkê hatîye kirin. Piştî xelaskirina xemilandina bûkê, bûk ji bo mala zava tête veguhestin. Di rêûresmê veguhestina bûkê da rêka çûnê di nava sûk û çarsîyê da diçe. Dawetî bi xemla xwe ve bûkê bi rêûresmeke şahane derbaz dikin. Di vê veguhestinê çeyîza bûkê jî tête neqilkirin. Sifî di nava texterewanekê da hatîye birin. Hemî bajêrên tîn seyra rêûresma veguhestina bûkê. Di vê veguhestinê da amûretên muzîkê tîne lêdan, dawet û dîlan tête gêran û stiran tîne gotin. Dema bûk digehe ber derê mala zava, Tacdîn û hinek malmezînen di li ser şaneşînê amade dibin. Tacdîn û hevalên xwe ji şaneşînê tebxên tijî pere, zêr û mucewher jor da xalî dikin li ser texterewanê bûkê. Xelkê jar û feqîr an jî zarok wan tiştan ji bo xwe kom dikin. Di vê navberê da cûmbûş û keyf û şahî zêdetir lê tê. Berîte, sema, saz û govend tîne gêran. Bi vî rengî heft şev û heft rojan daweta Sifî û Tacdînî dewam dike (Xanî, 2010, ss. 120-129). Wekî em ji van gotinan têdigihin xemilandina bûkê, veguhestina bûkê û çeyîza wê, pêşwazîya zava ji bo bûkê û dîyarî lê reşandin û dîlan vê gavê jî li nav kurdan berdewam e. Berê berbûkan bûk dixemilandin lê niha diben kuafêran. Herwesa berê bûk li hespan siwar dikirin û vediguhestin lê niha bi 'erebeyên xemilandî ve vediguhêzin. Dema veguhestina bûkê qafîla 'erebeyan li nava sûk û kolanan digerin. Berê dema bûk dihate ber derê zava, li gundan gûz û şekirok li ser serê bûkê direşandin. Lê niha ev kevneşopî li bajêran nemaye. Her çend li bajêrên mezîna dema dawetê bi çend sa'etên ve li salonên dawetê ve hatibe sînorkirin jî li gundan û gelek bajêrên din ên Kurdistanê dawet li derve tîn kirin û sê rojan dewam dikin.

Şeva Gerdekê

Li dû vegotina Xanî, di sihara roja heftê ya dawetê karûbarên şeva gerdekê tîne kirin. Bûk û zava bi harîkarîya kuafêr, dayîn û birazava xemla xwe dikin. Ev kes odeya gerdekê amade dikin. Li dû 'adetên wî zamanî buxûr û bêhnên xweş û dilveker, vexwarin û amûretên vexwarinan, amûretên keyf û zewqê û hinek xwarinên qûwetker hatine amadekirin. Ode bi şemal û findan tê xemilandin. Paşî bûk û zava tîne odê û bi tenê dimînin (Xanî, 2010, ss. 130-132). Wekî ji van gotinan dîyar dibe li dû kevneşopîya wî zamanî berê oda bûk û zavan tê xemilandin û paşê sifreyeke tijî xwarin û vexwarin tê amadekirin. Herwesa bêhnên dilveker û zewq-dêr jî tîne hazîrkirin. Xanî, di berdewamîyê da dibêje:

*“Ey sa’îyê meqseda tewafê
Wey salîkê menheca metafê”*

Xanî, zava dişibîne kesê bi meqseda tewafê diçe an jî kesê di rêka çûna tewafê da (Xanî, 2010, s. 132). Di folklorê kurdî da peyva tewafê ji bo gehiştina du evîndaran a bê perde tê bikarînan. Gehiştin û hevşabûna cinsî ya du evîndaran wekî tawafekê tê dîtin. Di stiranana da taybetî dema du evîndar digehin hevdu û hevdû maç dikin an jî bi hevdû ra dileyîzin, ev çende wekî “tewafa sîng û beran” tê binavkirin. Dîndarekî ji dil çawan muştaqî tewafa beyta şerîf be, evîndar jî wesa teşneyê bihevşabûnê têne dîtin.

Piştî bûk û zava dikevin oda gerdekê û xelwe dibin, li dû kevneşopîya wî zemanî birazava yanî Mem çekên xwe hildigire û li ber dergehî dibe nobedar. Li dû vegotina Xanî, Mem li ber dergehî hem nobedarîyê dike hem jî ji bo bûk û zavan du’ayan dike. Çûnkî li dû bawerîyên wî serdemî dibe ku di dema gerdekê da hinek kesên dijmin û xerabkar bi rêya efsûn û sêhrê wan girêbidin û xerabîyan bînin serê wan (Xanî, 2010, s. 133). Ev bawerîya derbarê şeva gerdekê ya li nav kurdan da wesa dîyar e gelek kevin e. Kurd wesa bawer dikin heke kesên xerabîker di şeva gerdekê da bikarin xwe bigehînin nêzîkî oda gerdekê an jî bikarin wan bibînin û dengê wan bibihîzin, ew hîngê dikarin bi rêka efsûn û sêhrê bûk û zavan girêbidin û nehêlin ew bi hevdû şa bibin. Lewra di dema xelwebûna bûk û zavan da gelek hişyarî lê tete kirin da kes nêzîkî oda gerdekê nebe. Ev bawerî hêj vê gavê jî li nav kurdan li kar e. Bi rastî Xanî, ev kevneşopî gelek hostayî dîyar kirîye.

Xanî di beşa 25an da bi berfirehî teswîra şeva gerdekê ya Sîtî û Tacdînî dike. Di van teswîran da sahneyên hembêzkirin, lêvbûsîn, hevmaçkirin, hevdûgeztin, perixandin û hevşabûnê bi awayekî xurt têne raçavkirin. Li dû vegotina Xanî sê rojên ‘ewilî ew tenê bi hev leyîztine û hêj nebûne jin û mêr. Di roja çarê wan meyla zîfafê kirîye, Tacdînî tovê xwe li Sîtîyê çandîye û bi vî awayî şeva gerdekê heftîyekê dewam kirîye. Tacdînî di roja heştê ji odê derdikeve. Mem heta wê gavê li ber dergehî nobedarîyê dike (Xanî, 2010, ss. 134-138). Bi rastî ne di berhemên edebî yên klasîk ne jî di hîkaye û destanên folklorîk yên kurdî da çî caran behsê şeva gerdekê nehatiye kirin. Lê belê Xanî xîlafî vê çendê cihekî berfireh daye vî babetî. Wekî em dizanin di folklor û edebîyata kurdî da erotîzm bi ser û çavan û sîng û beran ve tete sînardarkirin. Xanî her çend ji bo Tacdîn û Sîtîyê ji vî tuxûbî derbaz bibe jî ji bo Mem û Zînê girêdayî vî tuxûbî ye. Dema Mem û Zîn berê li baxê mîrî û paşê jî li serayê bi tenê hevdû dibînin, teswîrên erotîzmê raçavî me dike. Her çend ew; lêv, dêm, sîng û ber û gerdana hev ramûsin û bigezin jî Xanî rê nade ku ew ji kemerê an jî navtengê xwarkevin. Kemerê wekî sînorekî di navbera wan da dîyar dike:

*“Ew ger çi hebûn ji hev bi hîvî
Emma nediçûn qewî nişîvî”*

Hubba di dilan ji heddê der bû

Serheddê zerafetan kemer bû” (Xanî, 2010, ss. 188-189)

Di Mem û Zîna Xanî da erotîzm di navbera Mem û Zînê digel teswîrên sahnayên erotîk yê folklorîk digunce û wê ji sînore ser û çav û sîng û beran nabe xwarê.

Nêçîr û Nêçîrvanî

Di folklorê kurdî da nêçîr cihekî gelek girîng digire. Xanî di berhema xwe da bi berfirehî behsa nêçîrê dike. Ji vegotinên wî em derbarê nêçîr û nêçîrvanîya wê serdemê serwest dibin. Li dû zargotina Xanî di dema biharê wextê çîya û banî kesk dibin û kanî û rûbar boş dibin, heywan ji sitargehên xwe derdikevin û bi meqseda çerîn û xwarinê belav dibin. Mîr biryarê dide ku êdî wextê geşt û seyran û nêçîra heywanê kovî hatîye û emir dike sibê digel wextê seherê herkesê çekhelgir bila karê xwe bike em dê biçine nêçîrê. Li dû vî emrî divê kesek bê mezaret bêemrîya mîrî neke. Dema seherê nêçîrvan çekên xwe yê wekî gûrz, şîr, tîr, çogan û gopalan hildigirin û ratiba xwe amade dikin. Ji bo nêçîrê heywanên wekî ‘uqab (qertel), bazî û tazî têne birin. Di nêçîrê da heywanê kovî yê dirinde (gurg, piling), dewende (xezal, kîvroşk) û pirinde (qaz, quling, kew) an têne kuştin an jî têne girtin. Goştê heywanên kuştî li feqîran têne belavkirin û heywanên girtî jî ji alîyê mezin û kenkeneyan ve têne birin û wan ji bo xwe xwedî dikin (Xanî, 2010, ss. 173-176). Li dû vegotina Xanî rêûresmê nêçîrê bi vê çendê ve naqede. Piştî nêçîrvan vedigerin bajêrî hemî pêkve diçin baxê mîrî û li wê derê şahîyek têne vebestin. Mîr û leşker û ehlê bajêrî yê nêçîrvan di rêka veşartî da deng û gazegazeke zêde dikin. Zirne û nefîr têne qutan û li dû merasîmeke leşkerî têdikevin bajêrî. Hem dengê nêçîrvanan û heywanên kovî yê girtî û hem jî dengê xelkê pêşwazîya wan dike wekî oxilmeyeke giran bajêrî vedipêçe. Nêçîrvan, heywanên girtî berdiden li baxê mîrî û paşî bi emrê mîrî ji bo bêhnvedan û îstîrahatê diherikin nava rezê mîrî. Li wê derê keyf û şahî têne gêran û xwarin û vexwarin têne belavkirin (Xanî, 2010, ss. 191-194). Di gelek destanên kurdî da leheng di heman demê da nêçîrvan e. Di hinek varyantên Memê Alan da Mem jî digel mîrî diçe nêçîrê û di nêçîrê da wekî nêçîrvanekî jîr û zîrek xuya dike. Nêçîrvanî wekî taybetîyeke girîng ya lehengan dîyar dike. Lê belê Xanî, Memî nabe nêçîra pezkovîyan, wî dibe baxê mîrî û wî û Zînê bi hevra digehîne. Di teswîrên wî yê derbarê nêçîra xelkê Botanê da bi awayekî vekirî çûnûhatina ji nêçîrê, çek û xwarinên nêçîrvanan û navên heywanê kovî têne dîyarkirin.

Veşartina Mirîyan û Şîn

Di Mem û Zîna Xanî da wesîyet, mirin, şîn û rêûresma veşartina mirîyan cihekî girîng digire. Di van rûdanan da em derheqê çawanîya van cûre bûyerên wê

serdemê hînî gelek tiştan dibin. Mîr, Memî diavêje hebsê û demeke dirêj ew tê da dimîne. Lê belê Mîr ji ber dijberîya Tacdîn û birayên wî mecbûr dimîne zewaca Mem û Zînê qebûl bike. Paşê bi rênîşana Beko gazî Zînê dike û jê ra dibeje min ji bo tehqîqkirina rastîya evîna Memê ew avêtîbû zîndanê û niha min tesdîq kir ku ew evîndarekî sadiq e û evîna wî êdî kamil bûye. Ji ber vê çendê êdî ez te dideme Memê û here wî ji zîndanê derîne. Dema Zîn van xeberan ji birayê xwe dibihîze êdî perdeyê şermê didirîne û hestên xwe eşkera dike. Zîn bê hemdî xwe dest bi girînê dike û nehiş dikeve erdî. Di wê gavê da yek ji nişkê ve ji derve têt û dibêje Mem mir. Zîn bi dengê wî kesî ve herwekî ji mirinê vejî hişyar dibe û gotinên xwe yên dawîyê dibêje Mîrî. Zîn bi kurtî dibêje Mîrî, bixwe roja Mem ketîye zîndanê ez jî miribûm. Lê belê ez tenê benda hindê mabûm, tu bizanî û îqrar bikî ku evîna min û Memî pak û bilind e û em gehiştîne merteba kemalê. Te bi xwe tehqîq kir ku Mem aşîqekî sadiq e û qelbê te jî vê çendê tesdîq dike. Piştî tu vê rastîyê têgehiştî êdî ruhê Memê di bedena wî da namîne. Ruhê wî ji bo ji qalibî firîne benda îqrara te bû. Ez jî herwekî Memê li benda îqrara te bûm da tu bizanî ji bo parastina nav û namûsa te ez zindî mame. Belê bi îqrara xwe ve te ruxseta derketina ruhê min jî ji qalibî da. Êdî evîna Mem û Zînê kamil dibe, evîna wan dibe evîneke îlahî û ji bend û qeydên bedenî azad dibin û ruhê wan di ‘alema me’newî da digehin hevdu (Xanî, 2010, ss. 235-242). Piştî van gotinan Zîn wesîyeta xwe ji Mîrî ra dibêje. Di wesîyeta xwe da ji Mîrî dixwaze, wî çawan daweta Sitî û Tacdînê kiribû herwesa merasîma veşartina termên wê û Memî da jî ew merasîma şahîyê bête kirin. Sûk û çarşîya bajêrî bête xemilandin, leşker li hespên xwe siwar bibin û wekî şahîyên cejnan cirîdanê bikin. Mutrib û saz bêne amadekirin û herwekî veguhestina Sitîyê, cenazê min jî bê veguhestin. Wekî texterewana bûkîniya Sitîyê, ji bo min jî tabûteke zêrîn bête çêkirin. Xelk dema cenazeyên me dibene nav goristanê da nebêjin daweta Sitîyê çend xweş bû û veguhastina Zînê nexweş bû. Zîn di berdewamiya wesîyeta xwe da ji mîr dixwaze ku di her xêreka ew di salekê da dike bila niyeta Zînê jî lê bîne. Zîn di dawîya wesîyeta xwe da jî ji mîr dixwaze ku dema ew mir bila ew û Mem pêkve li gorekê bêne veşartin û çî perde û asteng di navbera wan da nebe (Xanî, 2010, ss. 244-250). Di wesîyeta Zînê da em rastî çend hêmanên folklorîk tên. Di serî da Zîn behsê parastina nav û namûs û kerameta binemala xwe dike. Dixwaze birayê xwe têbigehîne ku evîna wî û Memê evîneke rasteqîn e û çî meqsedên dinyayî tê da nîne. Di gelek serhatîyên devkî da em rastî vê yekê tên ku leheng her tim şeref û kerameta xwe û malbata xwe diparêzin û dixwazin pakî û bilindîya evîna xwe ragehînin. Herwesa jîyan û mirina bi şeref jî berz tete girtin. Zîn dixwaze merasîma mirina wê wekî rêûresmê dawetekê bête kirin. Di nava kurdan da gelek caran merasîma cenazeyên kesên ji bo meqsedeka mezin dimirin an jî tene kuştin wekî dawet û dîlanekê tete kirin. Ew herçend ji ber mirina wî xemgîn jî bin, ji bo dîyaki-rina mezinahîya jîyan û mirada wî, rêûresmê mirinê wekî dawetekê bi rê ve diben. Noqteya dî ya balkêş ev e ku dema yek dimire heta dewra sala wî tamam dibe xêr

û xêrat ji bo wî têne kirin. Zîn jî ji birayê xwe dixwaze her xêraka dike bila nîyeta Zînê jî bîne û ji bo wê xêr û xêratên bike. Dewra salê ya mirîyan û xêr û xêratên tê da têne danê niha jî li nav kurdan dewam dike.

Piştî Mîrî destûra Zînê da ku biçê û Memê ji zîndanê derîne, ew ji serî heta pîyan xemla xwe dike û burka'ekê li serê xwe datîne û digel komeke jinan diçe ser derê zîndanê. Dema têtê li pêş Memî burka'ê li ser û çavên xwe hiltîne û ew û Mem bi hevra suhbetê dikin. Piştî xelasbûna axaftina wan Mem dimire (Xanî, 2010, ss. 251-259). Ji van rûdanan em têdigehin ku jinên – taybetî jinên bajêrî- wî zemanî dema ji malê derdikevin burka'ê li serê xwe datînin. Tenê roja Newroz û sersalê rûvekirî digerin. Dema xebera mirina Memê li hemî bajêrî belav dibe welweleyek û hewarek dikeve bajêrî û xelkê bejêrî hemî qesta cenazê Memê dikin. Di vê navberê da Tacdîn rastî Beko têt û di gavê da wî dike. Gava Tacdîn têtê hindav termê Memî û wî bê ruh dibîne tac û tomarên li ser serê xwe diavêje li ser termê wî û ji xemên xwe da wekî dînan lê têt. Kes newêre bal wî ve biçê. Mecbûren xeberî digehînin mîrî û mîr têt wî bi zincîrê girê dide. Dema cenazê Memî ji wê derê hate rakirin li nav xelkê qîyamet radibe û Tacdîn qeyd û zincîrên xwe dibizdîne. Tacdîn dibize û xwe di termê Memî werdike. Tabûta wî didane li ser serê xwe û dest bi efxan û fîxanê dike. Li dû vegotina Xanî hemî ehlê bajêrî kincên matemê li xwe kiribûn. Xatûn û serejinên bajêrî yên nîqabpoş di bin kolozê xwe da gêsûyên xwe berdabûn û ji serî heta pîyan xwe li kincê reş pêçabûn. Êdî desmal, laçik, burqa' li ser serê wan nemabûn. Zêmarbêjan dest bi zêmar û pêgotinê kiribûn. Zîn jî rabibû li ser pîyan, li ber dengê mûzîkê bi reqqaskî li pêş cenazê Memî diçû. Hewayeke giran bajêr dorpêç kiribû her kes ji ber mirina Memê xemgîn ketibû. Bi bawerîya Xanî xelkê Botanê ji wê rojê wê ve şînî, sîyahpoşî (reşgirêdan), çarşev, 'îzar û poşî kirine 'adet (Xanî, 2010, ss. 260-263). Di van teswîrên rêûresma şînê da em hîn dibin xelk hemî beşdarê merasîma şînê dibin. Zêmarbêj an jî nêzîkên mirî zêmaran dibêjin û bendan bi jarî û bextreşîya mirî dibêjin. Kesên zêde nêzîkî mirî û mirî li ber dilê wan gelek 'ezîz ser û çavên xwe vediçîrînin û xwe di termê mirî werdipêçin. Jinên çî caran bê nîqab û perde dernekevî, perdê şermê radikin û nîqab û poşîyan ji serê xwe diavêjin û gêsûyên xwe berdiden. Di şînê da her tim kincên reş li xwe dikin. Wekî em niha jî dibînin jinên Cizîrî çarşeva reş li xwe dikin û rûyê xwe bi poşîyê vedişêrin. Li dû gotina Xanî, ev 'adete ji merasîma şînîya Memê maye û heta roja me dewam dike. Di rêûresmê şînîyê da noqtaya herî mûhîm reqasa Zînê ya li ber cenazeyê Memî ye. Herwekî me li jorî jî behskirî ev 'adete li nav kurdan niha jî li kar e û kesên li nav xelkî da zêde têne hejêkirin heke di rêka armanceke mezin da bimirin an bêne kuştin, merasîma cenazeyê wan ji alîyê hezkerîyên wan ve wekî rêûresmeke dawet û dîlanê têtê gêran.

Xanî di berdewamîya rêûresmê cenazeyê Memî da teswîra cenaze veşartin û şîna Zînê ya li ser mezarî dike. Li dû vegotina wî, dema cenazeyî dibene li nav goristanê Zîn cendekê Beko dibîne û Mîr û Tacdînî qanih dike ku cendekê wî li ber

pîyên gora Memî bê veşartin. Çunkî evîna saf; kîn û dijminahîyê nahewîne û Beko bûye sebebê safî û pakîya evîna wan û bi saya wî evîna wan bûye evîneke îlahî (Xanî, 2010, ss. 264-266). Termê Memî yê hatî kefenkirin teslîmî axê dikin. Cendekê Beko jî li ber pîyên wî vedişêrin. Li ser serê Memî kêlîyek tête danîn û paşî Zîn tête hindav mezarê Memî. Zîn bi dilekî sotî dike girîn û fixan û herkes ji ber halê wê pir muteesîr dibe. Dema Zîn bêhêz dibe, li ber serê Memî rûdine, bi wî ra tekelûmê dike. Zîn di tekelûma xwe da bejna xwe dişibîne baxekî an jî rezekî ‘aîdê Memî. Dibêje ez dixwazim di hemî berê vî rezî jê bibem da kesek dî xwe lê neke xudan. Lê belê ev baxe yê te ye û ez ditirsim heke tu qusîrekê li vî baxî bibînî dê ji te şermende bibim. Lewra ez çî kê m û kasîyan nagehînim bedena xwe û xwe ji ciwanîyê bêbar nakim. Çunkî bi nêzîkî ez jî dê bimirim û bigehime te. Ji ber hindê ez ser û çavên xwe naveçîrînim û kezî û biskên xwe nabirim. Zîn piştî van axiftinan ruhê xwe teslîm dike û dimire (Xanî, 2010, ss. 267-271). Di serhatî û stiranên kurdî da lehengên keç gelek caran bejna xwe an jî bedena xwe dişibînin baxekî an jî rezekî û vî baxî wekî ‘aîdê dildarê xwe dibînin. Hindî ji wan têt sexbêra vî baxî dikin û nahêlin çî kê m û kasî bigehe wî. Yanî digel safî û pakîya evîne divê safî û pakîya bedenî jî bê parastin. Taybetî di serhatîya Le’lîxana Goveyî û Hesam Axa da ev dîyarde berçav e. Herwesa Xanî bi devê Zînê dîyar dike ku divê di şînî û mateman de jî sînorê şerî’etê nehêt derkevtin û zerer li bedenî nehêt danê. Li dû vegotina Xanî piştî Zîn jî dimire, wê kefen dikin, gora Memê vedikin û wê bê perde û wesite li kêleka Memê dispêrin axê. Şîna herdû evîndaran sê şev û sê rojan dewam dike (Xanî, 2010, s. 271).

Li dû gotina Xanî li ser gora Mem û Zînê darên senewberê û serwîyê şîn dibin. Ev herdû cûre dar xwe têk werdikin û bi vî awayî bilind dibin. Lê belê ji gora Beko darek hindî dara kinêrê ya bi stîrî bilind dibe û dikeve navbera herdû darên dî û wan herdû daran ji hevdu cûda dike. Yanî Beko di gorê da jî herdû evîndaran rahet nahêle û rê nade ew herdû bigehin hevdu (Xanî, 2010, ss. 275-276). Ev dîyardeya Xanî vediguhêze hema hema li gelek serhatîyên evîne yên folklorê kurdî da derdikeve pêşîya me. Reqîb an jî kesê nehêle du evîndar bigehin hevdu piştî mirinê jî bela xwe ji wan venake û li wê derê jî astengîyan bo wan derdixe.

Reml, Falbazî û Efsûnkarî

Di Mem û Zînê da babeteke dî ya bi folklorê ve girêdayî reml, falbazî û efsûnkarî ye. Di metnê da derbarê van bawerîyan û pêkînana wan da em gelek agahîyan serwext dibin. Di Mem û Zînê da falbaz û nûjdar di şexsê Heyzebûnê da têne danasîn. Heyzebûn pîrejîneke xudan serbor e û li seraya mîrî dijî. Ew dayîna Zîn û Sitîyê ye. Li dû vegotina Xanî, Heyzebûn piştî vegera Sitî û Zînê ji sersal û Newrozê û bengîbûna wan, ji bo nasîna evîndarên wan herdû keçan dest bi xebatê dike. Berê ji wan herdû keçan dixwaze ku serhatîya xwe bi temamî ji bo wê bibêjin.

Heyzebûn di berdewamîya axaftina xwe da dîyar dike ku heke hûn serbora xwe ji bo min nebêjin jî ez dikarim bi rêka rêtina remlê an jî bi rêka danana şûşe û kûreyê nav û nîşanên evîndarên we bizanim (Xanî, 2010, ss. 86-88). Lê belê dema Sîfî û Zîn serhatîya xwe dibêjin û Mem û Tajdîn wekî du perî û keçan didin nasîn, Heyzebûn dibêje ev rûdane muhal e, ne mumkîn e. Çunkî divê keç li kuran û kur li keçan bibin evîndar. Lewra bi bawerîya Heyzebûnê ev serhatîya wan an xewn an jî xeyal e (Xanî, 2010, ss. 89-92). Hîngê Zîn dibêje ev xewn an xeyal nîne. Gustîrên wan wekî nîşan li cem me ne. Madem te digot ez bi rêka gazîkirina cinan û bi çêkirina nivîştîyan ve ji xeybê agahdar dibim kerem bike xudanên wan gustîran peyda bike (Xanî, 2010, s. 93). Li dû vegotina Xanî, Heyzebûn bi rastî falbaz an jî remildar nîne. Wê wekî hîlekar û cazûyê dide nasîn. Çunkî herçend Heyzebûn bibêje ew dê îşev remlekê bavêje û xudanên gustîran derêxe meydanê jî bi rastî ew gustîrê dibe nik remmalekî cuda (Xanî, 2010, ss. 93-95). Em ji vê çendê têdîgehîna ku bi rastî Heyzebûn falbaz û remildar nîne. Lê belê pîrejineke serbor û zana ye. Dizane kanê dê çawan hest û boçûnên herdû evîndaran ber alî bike û bigehe encamekê. Ew dixwaze keçan bitirsîne û rastîya serhatîyê ji wan hîn bibe.

Piştî Heyzebûn diçe nik remmalekî rastîn hîngê em rastî teswîrkirina reml, sêhr û efsûnkarîya di civaka kurdî tîn. Li dû vegotina Xanî, Heyzebûn diçe nik remmalekî, serhatîya Sîfî û Zînan wekî serhatîya du kurikan bo wî vedibêje. Ji remmalî dixwaze bizane kanê derdê sebîyên wê çi ye û xudanê gustîran kî ne (Xanî, 2010, ss. 95-96). Piştî ku remmal, li dû qaîdeyên ‘ilmê remlê li şiklê falê dinêre rastîya serhatîyê serwext dibe û dizane ku Heyzebûnê ji bo wî derew kirîye û rastî berevajî kirîye. Remmal dibêje sebîyên te kur nînin keç in û evîndarên wan jî du kur in. Ev gustîr yê wan kuran in, dane herdû keçikan û herwesa gustîrên herdû keçan jî li nik kuran in (Xanî, 2010, ss. 97-98). Piştî rastî bi vî rengî derdikeve meydanê Heyzebûn dixwaze nav û ‘eslê wan herdû kuran bizane. Remmal ‘eslê wan dîyar dike belê navê wan nabêje. Lê belê remmal îhtîmal e ji bo bazarşidandinê navê herdû kuran bi diristî aşkera nake û dibêje kincên tebîban li xwe bike û li bajêrî bigere. Tu kî derê du kurên nexweş û tawî bibînî hîngê tu dê bîşêy wan herdû kesan peyda bikî (Xanî, 2010, ss. 99-100).

Xanî, di şexsê Heyzebûn û remmalî da teswîra du hêmanên folklorîk yên di wê serdemê dike. Yek ji van Heyzebûn e ku dixwaze herdû evîndaran bigehîne hevdû, bi êkûdu bide nasîn û navgîniya herdû alîyan bike. Di civaka kurdî da kesê di navbera du evîndaran da hatinûçûnê û navgîniyê dike, wekî me jorî jî behskirî, wekî “navdesk” tête pênasekirin. Navdesk çi jin çi jî mêt be divê şareza, jîr, devxweş, serwext û xudan pêşbînîyeke xurt be. Di civaka kurdî ya girtî da evîndar gelek caran nikarin bi rasterast hestên xwe ji bo evîndara xwe dîyar bikin. Bi rêka navdeskekî/ê pêbawer hestên xwe digehîne yekî/ê û bî navgîniya wî/ê îmkanên hevdûgehiştinê peyda dike. Hêmanê duyê yê folklorîk, remmal, sêhrbend an jî efsûnkar e. Herçend di folklorîk kurdî da gelek caran ev hêman bi karên xwe yên

xerab bê nasîn jî di Memû Zîna Xanî da bi başî hatîye teswîrkirin. Em têdigezin ku di wî serdemî da remmal hebûn û bi karên xwe ve di nava civakê da çalak bûn. Karê wan yê serekî eşkerekirina nihanîyan e. Falbaz, sêhrbend an jî efsûnkar di nava civaka kurdî da bi navekî din jî têne nasîn ku ew nav “xêvzank” e. Peyva xêvzank bi lêkdana peyvên “xeyb” û “zanîn”ê pêk hatîye û me’na kesê ji xeybê xeberdar e dide. Di nava Êzidîyan da xêvzank wekî “Koçek” tête nasîn. Karê xêvzankî yê sereke peyda kirina tiştê wenda an jî tiştê hatîye dizîn e. Xêvzank çî mêr çî jin be an jî çî xwenda û nexwenda be, heta vê dawîyê jî di nava jîyana kurdewarî da gelek çalak bûn.

Nûjdarî

Babetek din ya girîng bi folklorê ve girêdayî nûjdarî û dermanên kurdewarî ye. Di Mem û Zîna Xanî da bi kurtî be jî îşaret bi vê çendê hatîye dayîn. Remmal ji bo kişfkirina Mem û Tacdîn pêşniyazekê bo Heyzebûnê dike û dibêje rengê tebîban bide xwe û li nav bajarî bigere heta tu xwe digehînî wan herdûkan. Heyzebûn kincên hekîman li xwe dike, qarûre, huqqe, nişter, kîs û çend kitêban hildigire û li nava bajarî digere (Xanî, 2010, s. 100). Dema rastî eqrebayên Mem û Tacdîn tê, ew dizanin ku ev hekîm e û dixwazin nexweşên xwe bidin tedawîkirin. Di dîyaloga di navbera herdû alîyan da dîyar dibe ku ew behsa du cûre hekîman dikin. Cûreyekî hekîman nexweşî û birînên fizîkî tedawî dikin û cûreyekî hekîman jî bi nexweşiyên derûnî û evîni ve meşxûl dibin. Ji ber ku Mem û Tajdîn ne nexweşên fizîkî ne ew, li hekîmekî pispore derûnê digerin. Heyzebûn dîyar dike ku ew, hekîmê derdê evîne ye. Heyzebûn bi vî awayî xwe digehîne Mem û Tajdîn û wan ji Zîn û Sitîyê agahdar dike. Dema herdû evîndar ji dildarên xwe xeberdar dibin şad û bextewar dibin û rengê nexweşiyê ji wan kêma dibe (Xanî, 2010, ss. 101-105).

Her çend nûjdarîya di Mem û Zînê da tête teswîrkirin ne rasteqînî be jî em hîn dibin ku di wê serdemê da li nav civaka kurdî da herdû cûre nûjdarî û dermansazî hebûn. Di gelek serhatî û çirokên kurdî da behsê nexweşiyên ji ber evîne û cudabûnê peydabûyî û çareserkirina wan ji alîyê hekîman ve tête vegotin. Herwesa di civaka kurdî ya klasîk da cihekî girîng yê herdû cûre nûjdarî heye. Ev nûjdar hem birînên çermî hem jî hestiyên şkestî tedawî dikin. Herçend ji bo nûjdarî bi giştî navê “Hekîm” bête bi kar anîn jî ji bo nûjdarî hestiyên şkestî vedigirin û tedawî dikin navê “Cebaz” tête gotin. Hekîm ji gîya û tiştên cûda dermanan çêdikin û bi rêka wan dermanan hem birînên çermî hem jî nexweşiyên navxweyî tedawî dikin. Ji bilî vê çendê nûjdarî û hekîmîya nexweşiyên derûnî jî di civaka kurdî da belav bû. Nexweşiyên wekî hewaserî, dînbûn, tebhatin, kêmkî heyîvê, helingivtin, bênan û hwd. bi rêka dû’a, niviştî, pêvexwendin, bazbend, hemayîl û usûlên cûda cûda dihatin tedawîkirin.

Gotinên Mezinan, Biwêj, Du'a û Nifîn

Ehmedê Xanî di berhema xwe da cih daye hinek nimûneyên gotinên mezinan, biwêj, du'a û nifinan (nifiran). Zimanê Mem û Zîna Xanî her çend bi peyvên bîyanî ve dagirtî û giran be jî taybetî dîyalogên di navbera lehengan da ziman sade ye. Xusûsen di van dîyalogan da nimûneyên behşêkirî derbaz dibin. Li jêrî hinek nimûne tene dayîn.

“Ax û xulîyê bi ser xwe werkem” (Xanî, 2010, s. 269)

“Zeytê me û agirê me dîsa

berbû me we dil me pê eyîsa” (Xanî, 2010, s. 90)

“Gurî te me meqseda mi dûr e

dûr bît ji te! merqeda min kûr e” (Xanî, 2010, s. 249)

Gotin “dem û dewleta wî daîm” (Xanî, 2010, s. 230)

“Gava ku dibînî wextê îşret

da fewtî nekey zemanê firset” (Xanî, 2010, s. 114)

Encam

Mem û Zîna Xanî di gelek babetan da xudan taybetîyên cûda ye di gelek waran da pêşeng e. Taybetî û pêşengbûna vê berhemê xusûsen di hewlên avakirina hizra netewî û bizavên standartkirina kurmancî da diyarker e. Ji bilî van yek ji girîngtirîn taybetîya wê ew e ku nav û naveroka xwe ji serhatîyeke kurdî wergirtîye. Ehmedê Xanî berhema xwe ya bi navê Mem û Zîn ji ber destan û beyteke evîni ya di nava kurdan da berbelav nivîsîye. Ev berhem mijara xwe ji folklorê kurdî werdigire û ev çende yek ji girîngtirîn taybetîyên vê berhemê ye. Xanî, destana folklorîk li dû hizr û bîra xwe serejinû ava kirîye û terzê jîyana wî serdemî û hêmanên folklorîk yê li kar di berhema xwe da raçavî me kirîye. Ji ber vê çendê Mem û Zîn hindî ku neynika hest û bîr û boçûnên Xanî ye, herwesa ji bo nasîn û hînbûna terzê jîyana civaka kurdî ya wî serdemî û bîr û bawerîyên wê civakê gencîneyek e. Xanî, di teswîrkirina jîyana civaka wê serdema xwe da rasyonel e. Ev çende ji bo nasîna wê serdemê karê me gelek hêsan dike.

Xanî di berhema xwe da hêmanên wekî Newroz û sersal, zewac û dawet, nêçîr û nêçîrvanî, mirin û şîn, falbazî û nûjdarî yê girêdayî folklorê bi kar anîye. Ev çende diyar dike ku Xanî, civaka xwe baş dinasî û derbarê rêûresm û bawerîyên civaka tê da dijî xudan agahîyên berfireh bû. Wî, çavdêriyeke serkeftî li civaka xwe kirîye û ew, derheqê gelek hûrgilîyên di nava civakê da li kar şareza bûye. Xanî, xwe bi tenê estesîze an jî îdealîzekirina jîyan, bîr û bawerî û çanda maddî û me'newî ya civaka xwe ve meşxûl nekirîye. Wî, li şûna vê çendê wêneyê serdema xwe kêşaye û raçavî xwendevanan kirîye. Di teswîrkirina çanda maddî û me'newî ya civakê da hukmekî erênî an jî neyînî diyar nekirîye. An jî heke bi awayekî din

bête gotin heke bîr û bawerî an jî terzê rêûresmê bi dilê wî nebe jî, vê çendê ew ji teswîrkirin û raçavkirinê nedaye paş. Ev rêbaze ji bo hûrebûna wê serdemê materyalên gelek giranbiha dide me. Gelek hêmanên folklorîk yên di Mem û Zînê da têne vegotin û teswîrkirin, kêman zêde heta roja me ya îro hebûna xwe di nava civaka kurdî da parastîye. Ev çende, şarezayîya veguhestina çavdêriya Xanî nîşanî me dide. Ev xemxwarîya zanistî, gîyanekî rasteqînî dide teswîrên folklorîk yên Mem û Zîna Xanî û wê ji hêmanên folklorîk yên derasayî an jî efsanewî yên destana Memê Alan cuda dike. Bi vî awayî jîyan, rûdan, leheng, rêûresm, bîr û bawerî di Mem û Zînê da teqabulî realîteyekê dike. Rûdana destana Memê Alan bi diyalogeke xeyalî û mitolojîk ya di navbera perî û melekan ve dest pê dike. Li beramberî vê çendê rûdana Mem û Zîna Xanî, bi rêûresmeke rasteqînî (Newroz û sersal) ya di nava civakeke diyar da dest pê dike. Xanî serhatîya Mem û Zînê ji esmanî înyayê xwarê û li erdê bi cih kirîye. Ev çende ji bo nasîn û têgehiştina folklorê kurdî sûdeke mezin dide vekoleran.

Jêder

- Aktan, H. (2002). Kefaet. *Türkiye Diyanet Vakfı İslâm Ansiklopedisi*. (25/166). Ankara: TDV Yayınları.
- Cihanî, P. (2013). *Şîroveya Mem û Zîna Ehmedê Xanî*. Stenbol: Weşanxaneya Nûbihar.
- Ciwan, M. (1997). *Ahmedê Xanî jîyan berhem û bîr û baweriyên wî*. Stockholm: Weşana Weqfa Kurdî ya Kulturî li Stockholmê.
- Çiçekler, M. (2004). Mesnevi. *Türkiye Diyanet Vakfı İslâm Ansiklopedisi*. (29/320). Ankara: TDV Yayınları.
- Kaplan, Y. (2015). *Kaniya stranan*. Stenbol: Weşanxaneya Nûbihar.
- Korkmaz, V. (2019). *Berawirdîyek Li Ser Destana Memê Alan û Mem û Zîna Ehmedê Xanî ji aliyê bin-yad û honakê ve*. (Teza Lîsansa Bilind a neweşandî). Zanîngeha Mardîn Artûklîyê, Enstîtûya Zindî yên li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mardîn.
- Oy, A. (1997). Halkiyat. *Türkiye Diyanet Vakfı İslâm Ansiklopedisi*. (15/367). İstanbul: TDV Yayınları.
- Tek, A. (2015). *Osmanlı edebiyatında Mem û Zîn mesnevisi ve yayılımı*. (Teza Doktorayê ya neweşandî). İhsan Doğramacı Bilkent Üniversitesi Ekonomi ve Sosyal Bilimler Enstitüsü, Ankara.
- Xanî, E. (2010). *Mem û Zîn*. (amadekar Huseyn Şemrexî). Stenbol: Weşanxaneya Nûbihar.
- Yıldırım, K. (2010). *Ehmedê Xanî, Mem û Zîn, çeviri ve kavramsal tahlili*. İstanbul: Avesta Yayınları.